# Jîn

Jimara dehê | Heyva Sibatê 2007 | Vercinye, Emrîke | perê - 1

Ev sale ev bîrhatina cejina şîkirna deyk u babêt min pêncî sala ser wan ra bûrî.



deyk u babêt min li roja şîkirnê, 1957

Her dû deyk u babêt min li mal yêt bawerîa ‘Îsayê Mesîḧ kir mezin bîn. Deyka min li mala xu nexirî ye u babê min biçîkê çarê ye. Êk u dû dîtin u nas kirin wextê li kûllîa Incîlê dixwandin.

Wextê mezin bî ne, malêt wan gelek feriq hebîn!

Babkalkêt deyka min Holendî u Îrelendî u Inglîzî bîn u ji mêj e (1650) miḧacir bîn bu Emrîke. Deyka min li bajêrêt zorr li Kelifornya Başur mezin bî u babê min li zevîek biçîk li Orgena Rojava mezin bî. Her dem babê deyka min timbêla nî kirrî u ‘ewil êk bî wextê televizîun kirrî. Hindek car mala wan çûn xwaringehê da bixwin.

Babkalkêt babê min Almanî bîn. Nêzîkî sala 1875 babê bapîrê wî bar kir bu Emrîke. Mala babê min li mal zimanê Almanî axift ḧeta ew u meta min çûn medresê, u paşî mala wan zimanê wan guhurrî u Inglîzî axift. Mala babê min feqîr bîn. Wî u xoşk u birayêt xu kêm cilik hebîn. Mala wan timbêlek kevin hajutin. Kêm çûn xwaringehê da bixwin.



deyk u babêt deyka min — deyk u babêt babê min

Her dû temenî deyk u babêt min bîst u êk sal bî wextê mehir kirin. Piştî dû sala Xwidê birayê min da, u piştî salek u nîv Xwidê xoşka min da, u dîmahîkê piştî dû sal u nîv Xwidê ez jî dam. ‘Ewilî babê min her dû şul kir u çû kûllîê u jiber hindê mala me xu bir gelek ciha. Paşî me mala xu bir Teksis u ḧeta nuke deyk u babêt min man li wêrê.

Wextê şî bi êk u dû kirin, deyk u babêt min ji berî Xwidê u miruvêt xu u hevalêt xu sînd xwarin u gut dê mînin li gel êk u dû ḧeta mirinê – heker dewlemend bin yan feqîr bin, heker seḧeta wan baş bit yan xirab bit. Ew rêzê li êk u dû digirin u digel ta’etî bu Xwidê dikin – bi bigiştî u bi tinê jî. Ḧeskirna wan gehiştî bî ye. Li gel êk u dû maîn wextê li demêt zeḧmet u demêt keyf u demêt feqîr u demêt baş. Seḧeta wan baş bî u dem jî hebîn wextê seḧeta wan nebaş bîn. Em sê biçîk xudan kirîn u xizmeta miruva gelek car kir.

Babê min her dem rêberek yê dînî baş bî. Her roj me pêk ve Incîl xwand u bu êk u dû u bu miruvêt dî du’a kirin.

**Roja Evînîê pîruz bit, Deyk u Bab!** Ser xêrê bit bu pêncî sal we ḧe ji êk u dû kirî ne u rêka Xwidê jî girtî ne! ☺

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.